

KULÎLK

Fanzîna wêjeyî, çandî û hunerî

Hejmar - I

15 Berfanbar - 15 Rêbendan 2002

Ji bona nivîs, pêşniyar û rexneyên we, E-mail: kulilkaderengmayi@hotmail.com


JI EDÎTOR:

Merheba, xwendevanên hêja!

Ev yekem car e ku fanzîneke bi kurdî dertê. Ev fanzîn kulîlkek derengmayî ye.

Li gorî lêkolînan li Tirkiyeyê ji du hezaran zêdetir fanzîn dertên. Em jî çend ciwanên ku li Amedê dijîn, me got: "Ger bi tirkî ew qas fanzîn hene, çima bi kurdî nîn be?" Di destpêkê de armanca me ev e ku bi weşaneke bi vî rengî, dê zimanê kurdî bi pêş ve bixe, kesên ku bi kurdî dinivîsin berhemên wan bigihînin gel, ciwanan teşwîqî bi kurdî nivîsandinê bikin û ji hêlekê ve bingeha kovarekê amade bikin.

Di vê navberê de ji ber sedsaliya rojbûyîna helbestvanê nemir Cegerxwîn -her çiqas bi malîkekê neyê zimên jî- em dixwazin bi malîkekê, wî bibîrbînin...



*"Ditirsim ey welat bimirim
nebînim bextiyarî tu
Binivîsin wa li ser qebr im
welat xemgîn û men xemgîn"
Cegerxwîn*

EKOLOJIYA ZIMÊN

Amed Ç. JIYAN

Çi ye, tiştê ku Efrîqaya Rojava dike cihek ji cihên ku herî zêde cureyên zimanan nîşan dide? Antropologekî ji Oxfordê dibêje ku baran ji vê pirsê re dibe bersiv.

Ger hûn Efrîqayê ji rojavaya bakur, Senegalê heya rojhilata başûr, Kamerûnê bigerin, hûnê rastî 700 zimanên ku bi qasî Çînî û Îngilîzî ji hev û din cuda ne bînin. Kamerûn bi 12 milyon serjimariya xwe, ji 275 zimanên ji hev cuda ne re xwedîmalî dike; Togoya piçûk tenê xwediyê 50 zimanan e. Ev pîrbûna zimanan, zimanzan mat hiştiye. Berî her tiştî kesên li wê herêmê rûdinên, wekî kesên li Papûa Gîneya Nû -ku di dinê de di curebûna zimanan de tenê ev der ji Efrîqaya Bakur pêşketîtir e- dijîn bi çiyayên mezin ji hev veqetiyane. Angaşteke din ê Daniel Nettle Oxfordî ku zimanzan û antropolog e, heye. Nettle

ji çar salan ve, nexşeyên ku herêmên zimanan nîşan didin û nexşeyên ekolojiya wan deran li hev û din digire û li ser belavbûna zimanên Efrîqayê lêkolînan dike. Ev xebat berî niha ji hêla tu kesî ve nehatiye kirin. Nettle dîtiye ku, ber bi ekvatorê ve cureyên zimanan zêde dibe. Lê Nettle tiştêkî din jî dîtiye; di navbera dirêjbûna demsalên baranê û

hejmara zimanên li herême de têkiliyeke rasterast heye.

Nettle di xebata xwe de, Efrîqayê bi çarqorziyên ku her yek bi çend hezaran km², veqetandiye û mirovên di her çarqorziyê de jîmartiye. Dûv re ziman û barîna baranê daniye ber hev û din.

Li bakur, ku demsalên bi baran yanzdeh mehan didomin, pîrbûna zimanan gelekî zêde ditiye -li hinek cihan serê her çarqorziyê 80 ziman ditiye, li Saanaya ziwa ku salê ji 4 mehan hindiktir baran dibare, li nêzîkahiyên Sahraya Mezin serê her çarqorziyê hejmara zimanan heya 3 zimanan ketiye- wekî tê zanîn Nîjerya ku welatekî ziwa ye, xwedî 20 zimanan e, li başûrtir Nîjerya ku di heman mezinahiyê de ye, xwedî 430 zimanan e. Herêma belavbûna zimanan a herî piçûk heya gundekî dikeve. Li bakurê Nijeryayê, kesên bi zimanê Horom diaxivin, tenê 500 kes in. Bi giştî her gundî ji zimanekî zêdetir zane, yan jî ji bo bi qlaneke cîran re danûstandinê bikin, an jî ji hev jin bigrin û bistînin, divê zimanekî Frengî bikarbin. Dema mirov bi hûrbûnî li ser vê mijarê bisekine, wê bê dîtî ku li başûr pîrbûna zimanan, ji ber pîrbûna serjimariya wê derê ye. Lê, li başûrê Nîjerya ku herêma xwedî serjimariya herî zêde ye, bi giştî zimanekî bi navê Haûsa tê bikaranîn.

Nettle wê gavê merak dike, ka ev ziman çawa zêde bûne? Dibêje "Ger di salekî de zêde baran bibare, xwarinên ku pêdivî pê hene hûn dikarin berhev bikin." Bi vê yekê jî ji bo jiyînê bi cihên din re têkilî pêwîst nake.

Lê li cihên ku xetera xelayê heye, li herêmen xwarinên demsalî hene, bi komên din re têkilî pêwîst dibe. Nettle dibêje "Ger şeş mehên we yên ziwa hebin, ji bo wê demê, hûn nikarin xwarin berhev bikin. Ji ber vê yekê pêwîst e hûn toreke civakî çêkin." Ku tor mezin dibe, ihtîmalê zimanekî hevpar zêde dibe. Gelên Efrîqaya rojava, bi giştî li angaştê Nettle tên. Li bakur kartola şêrîn û zadên manyokî, her çiqas her dem pêdiviya wan bi baranê hebe jî, di piraniya salê de tîndarî, ji ber vê mirov bi komên piçûk dikarin bijîn û zimanekî ku kesên ji dereke din ve tîndarî nakin biaxivin. Li cihên wekî Nîjerya yan jî wekî Gana zadên sereke garisê spî û garisê gezikê ye. Her çî qas di demsalên ziwa de dikaribin bîr veşartin jî, xela radibe û bazirganî û zimanekî hevpar pêwîst dibe.

Ev dewlemendiya zimanan dibe ku wisa dom neke. Nettle dibêje: "Li Nîjerya, di nava çend sed salan de, dibe ku li dora 40 ziman bimînin, ne wekî vêga 400 ziman." Ger hûn li wir bijîn û zimanê Haûsa ku 20 milyon kes pê diaxive zanibin, hûn dikarin TV'yê temase bikin, ji bo derman û zibil(gubre) hûn dikarin dirav(pere) bibînin. Hînbûna zimanên mezin ji alî mirovan ve çêtir tê dîtî, seba wê jî tiştên bi xwe re tîne di aboriya pêşesaziyê de dibore.

**Glausiusz, J., Agust 1997
(wer., tirkî: Selda Arut, Bilim ve Teknik, hjmr:395, 1997)*

Şeveke hezîranê bû

Deşî REWŞEN

Di van şevên tirsonek de, ku stêrk xwe bi şermokî dilivînin, heyv ji min re rûyê xwe dibişirîne. Digotin kesê ku stêrkeke dişemite bibîne, hemû daxwaz û mirazên wan tîndarî. Şeveke meha hezîranê bû, ez li ser banê xênî bûm. Bayekî sarî hênîk rûyê min dialast. Gundîyan li ser benderan ji xwe re peyase û şora dikirin. Bi gelemperî li ber komên zada li hev dicivin û guftûgoya

pezkoviyan dikirin. Li benderên din jî, li du cihan nîska patoz dikirin. Dengê qarewara karkeran, li ber xirîna patozê difetisî. Car bi car meyla bayê diket hêla gund, wê demê gund di binê ewrê dûxanê de dima û her der xubareke spîçolkî digirt. Qarewara gundîyan bû. Her kesek li ser banê xwe nifir û çêra dikirin. Hinek digotin; "Xwedê qeda xwe bide we." Hinek jî digotin; "Hûn xêrê ji van nîskan nebînin." Û bi vî rengî piste-pista wan heta derengiyê şevê berdewam dikir.

Car bi caran çavên min diketin ser hev, lê min dixwast stêrkan temase bikim. Yek stêrkek bangî min kir, ji min pirsî; "çima wisa kûr diramî". Ez jî nişka ve werqilîm. Min der û dora xwe mîze kir, ji bilî xîşîna dara tûyê û dengê patozê tu tiştêk nebîst im. Rabûm serqunkî

rûniştim. Min kêliyê kesên ku dixebitin, ji dûr ve temase kir. Li ber şewla motorê, mirov wekî kûrmoriya diçûn û dihatin. Rabûm ser xwe hêdî hêdî ber bi derencikê ve çûm, daketim xwarê û min berê xwe da cihê ku patoz lê tê kirin. Min bala xwe da karkeran. Ji ber toz û xubarê rûyên wan spî û çavên wan wekî yên kundan sor bûbûn. Yek ji wan, di ber xwe de diaxivî û digot: "Lo! Ka li ser hev bavêje belkî qayîş bifilite, da

ku em hinek bêhna xwe bidin." Yek ji wan jî bi tîpên hûrik ji hevalê ba xwe re digot; "Xwezî aniha bahozeke rabûna, emê ji bona demeke kin xelas bibûna." Ê din jî digot; "Xwedê dengê me bibihîze" û bi vî awayî axaftinên wan berdewam kirin. Lê gelek westiyabûn û qirik û gewriyên wan tije xubar bûbû. Hêdî hêdî ji wan dûr

diketim, ber bi benderên din ve diçûm. Camêrekî fena kunda li ser koma genim rûniştibû û bangî min kir:

Kuro! Tu li ser benderan çî digerî?

Min bala xwe de zîlamê kal, li ber şewla heyvê qermîçokên li ser rûyê wî wekî hendefên geliyan dixuya. Axînek kur kişand û dest bi qalkirina rojên berê kir. "Tu zanî xwarzê: Meh meha hezîranê bû. Danê nîvro ye, qileqijeke sotîner hebû. Cendirme hatibûn bêşê û hemû



gundiyan li ber qotê gund li hev civandibûn. Min bala xwe da tertîbê min di nav me de nîn bû. Lê min dizanibû, ew dema xwe biveşêre, dikeve koxê. Ez jî hedî hedî çûm ber koxê û min bangî wî kir: "Erê derê tertîb, te dîtî" û tertîbê min jî bawer kir û jî koxê derket. Piştî derketinê leşker wekî cezayê xwe veşartinê, yek bi yek li piştî wî siwar bûn û çûn serê qot û hatin. Zanî xwarziyê min ew roj hêjî ji ber çavên min naçe."

Em demekî bi hev re kenîyan û dîsa meselokên xwe berdewam kir: "Destpêka payizê bû. Tertîbê min xetê firîngî û balîcanan eşêf dikir. Li kêleka baxçê wî jî, baxçê Mamo hebû û ew jî bi heman karî mijûl dibû. Rehma Xwedê lê be Rîfheto hebû. Pir jî gelemşe û tevliheviyê hez dikir. Çû li jora bendan rûnişt û bangî tertîbê min kir. Dareka biyê jî di nav baxçê Mamo de hebû û siya wê diçû ser baxçê tertîbê min. Rîfheto jî bang li wî kir û got: "Tu dizanî çima baxçê te nexweşokî ye?" Ew jî got çima? "Lê tu nizanî, ji ber siya dara Mamo tê ser şitila, loma." Piştî vê gotinê, hema tertîbê min jî nişka ve rakir bivirê xwe û xwe avêt nav erxê. Got; "Camêr divê tu wê darê jêkî." Mamo jî bi dengê nerm bersiv da: "Çima gundiye min, ma çi ziyana wê ji te re heye." Camêr xwe jî erxê avêt nav baxçê û bi bivirê xwe êrîş bir ser qurna darê. Piştî van geşedanan Rîfheto hire-hira wî zikopişt bû. Her du pevdiçûn û hev û din digevizandin. Ji ber tertîbê min mirovekî gir e û serê Mamo têdixe nav çengên xwe. Di vê navberê de fişe-fişa Mamo bû. Pîrekên gund

hatin hawara wan û jî Rîfheto pirsîn: çi bû? Wana çima şer dîkin? Rîfheto bi dengê bilind got: "Na xwişka min henekan dîkin", piştî van gotinan Mamo bihîst, bi dengê bilind got: "Ker di diya vira ne ku em henakan dîkin." Hetanî ku pîrekên gundî gihîştin hewara wan, Mamo nivrihî bûbû."

Di hêlekê de min wî guhdarî dikir û jî hêleke din ve stêrkan temaşê dikir.

Piştî çîroka Mamo, ez ber bi qiraxê newalê meşiyam. Waqe-waqa req û beqan û wîze-wîza çirçirokan mîna senfoniyeke li newalê olan dida. Ji nepeniya newalê, dûr ketin û ber bi malê de çûm. Hatim ber deriyê hewşê, derî ewqas riziya ye ku, tu pif bikî wê bikeve. Bi derencikê ve hilkişiyam ser banê xênî. Li ser doşeka hirî, xwe dirêj kirî min dest bi temaşekirina stêrkan kir.

Stêrk jî nişka ve li hev civiyan. Ez jî xwe re matmayî mam. Ev jî bo min rewşeke ne asayî bû. Li dora stêrkekê xelek çêkiribûn, carinan xelek xera dibû û jî dûrî ve dişibiya ewrên xubarî. Stêra qurixhilat bi bédengî, wan jî dûr ve temaşê dikir. Min jî Ahûramazda arîkarî xwest. Ew stêrka ku di nav wan de bû, xwe qucifandibû.

Diqijqijî...

Bê çare bû...

Ji nav wê geremolê niqutek hêstirên çavan berjêr bû. Hingî ku tîna xwe da derve, bayekî qeşemî balivî. Ew rondik di rê de qerisîn û bû zîpik. Bi ketina erdê re kaniyek der bû. Nebat jî nû ve zîl dan, hêvî seridîn di wê germahiya şevên hezîranê de...



Ti nîna

Wesar heredyo çimanî to de
Germinî bi tînjî teyna nê bena
Serd dano pero balesyenî
Vilî qû benî a

Berade porî xo
Wa horîkî şanî pero du
Derg ez hewnena reyanra
Bena qû ti nişka bêrî
Bê hêvî
Ti nîna
Lewanî mi de te'mî nê hamayîşî to

Xunav vareno
Tenî mi de hîbûney miçkerdîşî to nê ya
Ay varanêyo nika
De bêre
Wa dicey bû şew e
Sipeyî vowre ciqû
Rî to de bêrû wesar
Vilî akerî, çemî ravêrî
Pêlî zerey min bi çi virazyenî
De bêre
Wa teynayî nê bû ene hewe
Ez helm bibî latey to de

Rawana ZAYÎŞ

Roj û Heyv

Bêkes FARQÎN

Roj li ber avabûnê bû. Heyvê bi bawîşkan, telewîskên hişyarbûnê dida. Ji rengên wî yên gemarî diyar bû ku hê nû jî xew hişyar bûbû û ser û çavê xwe neşûştibû. Piştî bîstekê her du hevalan slav li hev dan û di rûyê hev re derbas bûn. Heyvê, nobeta asîman jî rojê send û hêdî hêdî xwe li nav rûkên asîman xist. Mîna şivanekî ku pezê xwe bijmêre stêrkên xwe di ber çavên xwe re derbas kir: Yek, du, sê, deh, bîst û şeş, hezar û hevdeh... Piştî jimartinê kêfekê xwe li rûyê wî danî. Yê firar tunebû. Hemû mêşinên wî li cihê xwe diçêriyan. Bi fike-fik destê xwe di serê wan da û meşiyam. Li ser lêvên wî stranekî evîndarî û xemgîniyê:
"Heylo lo lo, lo hey lo, hey lo lo!
Gava ku ji me pirsîn hûn çi yê hev û dinin
emê bêjin xwişk û birayê hev û dinin
Gava ku gotin rengê we ne yek e
emê bêjin bavê me yek e, dayîka me didû ye. ..."

Kêliyekê sekinî û dawîya stranê neanî. Kete nava ramanên kûr. Hinek tişt nexweş diçûn, lê wî yê çawa rast bikirina. Dema ku li rûkên erdê bûn û dema ku damariya wî lepên xwe yên hevîr li nav serî wî xist hate bîra wî. Dema ku lavayî kir ji Yezdanên dîlovan re dema ku giriya mirinê kete qirika wî hate bîra wî. "Xwedêyo! Ma çi hal e di serê me de hat." got; "Berê em xwişk û bira bûn." Bavê me, ji me pir hez dikir. Lê piştî ku diya me mir, bavê me yê bê îman û doxînsist ji xwe re jineke din anî. Ev jin bû damariya

me. Destpêkê de me li hev dikir, heta me ji hev hez ji dikir, lê di peyre, peyre çibû? Ji te re dibêm Xwedê, ji te re! Dengê min bibe xwe. Çima dengê min nabî xwe! Çima bersiva pirsê min nadî? Me qey guhê te giran e? Herê herê... Ma jixwe kengê, bahsa jiyana xwe bikim, tu xwe ker dikî û dengê min nabî xwe. Dîsa dengê min nebe xwe. Lê ezê bêjim. Ez ji qirikê tijî me. Bila berxikên min û mêşinên min guhdariya min bikin. Wan mêşinên bê ziman...

Loo! Berxikên min. Têjikên min, kanî hûn dengên min dibihîsin. Lalên min!

Di peyre wê damariya bê kok, bê esila qereçî min û birayên min şand tepika. Em çûn mexel, me tepikan berhev kir û me ji xwe re malokan çêkir û lîstin. Lîstikek çî qas xweş bû, we bidîtina! Berî êvarê me di bin bar de, bi inte-int xwe gihand malê. Damariya me mîna ku bi e'tiyê ketibe, kef bi devê wê ketibû. Ji sibê de li benda me mabû û nan li tenûrê nexistibû. Dema ku çav li me ket, ji nişka ve rabû ser xwe û mîna gurek dev bi xwîn dirêjî me kir. Tiştêkî ji me re nehişt. Çêrî dayîka me ye mirî, bavê me yê gerok û wekî dîn hemû zirûyeta me da. Bi destê xwe yê hevîr, bi keziyê min yê zer girt û bi lemata li nav serê min xist. Ez li dora xwe gerandim. Ji bona ku ez xwe ji destan xelas bikim, min xwe mîna daşikekî li erdê gevizand. Lê tu sude nekir. Birayê min ê delal ji tîrsa bi xirpînek reviya. Damariya min, mêze kir ku birayên min reviya ye, kulên wî ji di serê min de derxist. Ji dêvla wî ve ji çend

lemat li min xist û çend çêrê din ji da. Mîna dîna bû, nizanibû çî digot. Ser û binê gotina wê; "Serbavqunkê, min te kengê şand, belqityê tu li ku mayî. Bavê te yê bê namûs, wê a niha bê nêr bixwaze, ezê çî jarê bidimê. Hawarêê! Ezê çî bikim ji destê vê dêlikê. Xwedêyo ezê çî bikim!" Belkî dehan caran e wê van gotinan mîna pepûkê dubare kir. "Lê wî kuçikê lawê kuçikan, bê namûs lawê bê namûsan ew bi ku de revî. Qey ewê bi destê min nekeve? Ewê bi ku de here. Herê lawo herê, hûnê îşev bi ku de herin. Qey ezê we nekujim. Ku ez we nekujim bila ez ji we bim!"

Dema ku dev ji min berda, ez mîna berateyekê ketim xwarê. Çok nedihatîn ber min ku ez rabûma. Dev û pozê min di nav xwînê de mabû. Paçê min ê ku bavê min di êdî de ji min re kirîbû di şipare de qetiyabû. Û derdê serê derdan birayê min nizanîm di ku de teriqîbû.

- Xwedêyoo! Paçê min...

- Xwedêyoo! Birayê min...

- Xwedêyoo! Paçê min...

Şev bi serê min de hat, lê birayên min nehat malê. Damariya min awirên xwe yê tûj, li ser min kêr nake. Diranên xwe mîna kevirên aşê dibe û tîne. Xwedêyo ku birayên min bê, dê damariya min wê dev li serî wê bike. Piştî ku bavê rakeve, vê pîrebokê bê wê me bifetisîne. Bi xwedê divê ez birayê xwe bibînim û em ji van deran birevin.

- Keçê were şivê! (Nava eniya wê heftçiqir bû. Di dengê wê de

fermandarî hebû. ê divê min xwe bi awayekî çep bikirina û bireviyama.)

- Na dayê ez têr im.

- Keçê te çî jahrandiye? Were şivê ji te re dibêm. (Bavê min di bin çavan de em buhart. Û dîsa serê xwe kir ber xwe û kevçiya fasûla bir devê xwe.)

- Herê herê dayê. Ez ji xwe re kevçiyek bînim û bêm. (Damariya min pîvaza şîn di nava diranên xwe de hêrand, mîna ku kekê min bihêre. Kir ku tiştêk bêje, lê negot û destê xwe dirêjî nêr kir.)

Ez hêdika ji cihê xwe rabûm û min xwe ber bi derî ve kişand. Dilê min mîna çivîkek ku xwe li qefesê bixe dikir zinge-zing. Ew riya ku sê gav tune, li min bû riya sê rojan. Diçûm û nediçûm nediqediya. Gava min xwe gihand derî li pey xwe

fîlîm û cara dawîn min li malbata xwe nihêrî: Xwedêyo! Bavê min çî qas reben bû mîna serjinîkek, damariya min jê re çî bigotana wî ji wisa dikir: Mîna leş-kerek. Lê damariya min mîna fermanîdarê welatê bê ser û bin, girdikê mil paş vekîşî, çîçikên wê li pêş û qeleviska rûniştibû. Min di dilê xwe de çêrê wê da û di derî de derketim. Şev tarî bû mîna her gav, mirov pêşiya xwe nedidît. Du-sê caran dikir ez biketama erdê lê min xwe xelas kir. Birayê min, li benda min di bin dara

çinarê de rûniştibû. Dema ku ez gihîştîm balê ji hêrsan dikir min çêrî wî ji bidana, lê min dît ku ew bi hev de zero-mero bûye û diricife. Dilê min kizirî, min deng nekir. Kêliyê em wisa li hev lefandî sekinîn. Çivîkên dilê me westiyabûn... Kekê min dest bi gotinê kir.

- Emê çî bikin? (Di dengê wî de, bêhna tîrsê hebû.)

- Nizanim.

- Dayîkê pir hêrs bûbû, digot; "Ku ez wî..."

- Hişt be! Keçê!.. Ez naxwa-

zim navê wê bibîhîsim. Wê çêrê da- yê kir. Tu çawa jê re dibê "dayîkê"!.. (Pir bi hêrs bû, min newiribû dengê xwe bikirana. Kêliyê em wisa sekinîn û guhdariya dengê bédengiyê kir. Ji jêr de beqan bi dengên xwe, beşdariya dengên bêçaretîya me dikirin. Wê yekê em bêtir bê çare

dikir.)

- Keko emê çî bikin? (Stêrk di çavên wî de dilîstin.)

- Nizanim. Lê hêviya min ji Xwedêye! Hema bila min bike 'Roj' û bavêje rûkê asîman.

Hê gotin di devê wî de bû. Bi şîrqînekê asîman qelişî û mijek li me danî. Ev çî karesat e ku tê serê me. Kekê min li ber çavên min winda bû. Ez kelegirî bûm. Rondikên çavên min bê hemdê xwe hatin xwarê. Yek birayekê min hebû, êdî ew ji nîn e.



Xwedêyo! Min ji bavêje kêleka kekê min, hema ez wî carek an du car ji bibînim bes e. Min xwe nedî, mij vebû û min kişand nava xwe...

Hawê ku hûn jî dibînin, a niha ez Heyv im û birayê min jî Roj e û baş e baş hev û din nabînin." ...

Berdestê sibê bû. Heyvê bi stranên xemgînî şevê derbas kiribû...

Rojê çavê xwe difirikand û heyvê televîskên razanê dikişand.

- Çawa yî keko? Min bêriya te kiriye.

- Baş im xwişkê, ma hêna duh me hev du dît. Çi bûye ji te, ev çi halê te ye. Qey tu giriyaî?

- Na! Keko na! Xwelî kete çavê min, sorbûnî ji wê ye.

- Wa! Ê baş e, oxir be.

- Serçavan.

Heyva reben bi xemgîniya xwe, rabû çû welatê razanê...

Jîn

Gava ku gul vebûn

Darên behîva bişkuvîn

Nêrgiz û sosinan avêtin der

Li qiraxa Dîjle û Ferat

Ewê dîsa bixemile

Jîn li gulistan

Jîna nû derketiye

ji bin destan...

Sîdar JÎR

Du rengên jiyanê

Melîke GULER

Şeveke zîz û tarî bû. Dîrok hat û li gundekî bû mêvan. Wê şevê, mirin ketibû milê jînê û derketibû rêwîtiyek dirêj. Mirin û jiyan di milê hev de, gihîştin vî gundî. Mirin ket tariya şevê û xwe veşart. Ma li benda seydê. Êdî bûbû nêçîrvanê bextewariyê. Jiyan ket ronahiya rojê û ma li benda bextewariyê. Dilê jiyanê bûbû evîndara xweşî û bextewariyê. Şeveke dirêj...

Haya gund ji bayê felekê tunebû. Lê belê, ev gund bûbû şahidê zayîna stêrkan. Wan mîna gangilokên biharê, ezman xemilandibûn. Riya kadizê bi wê dîmena xwe ya bê hempa dirêj dibû, li ezmanan û hîvaçardeşevî mîna bûkeke nû dibiriqî û berê xwe dabû jiyanê. Di awirên wê de, hêvîdariya bûkeke nû ji bo bextewariyê hebû. Lê çi fêde, ew dem pir dirêj berdewam nekir. Lewre, mirin û jiyan bi hev re digeriyan. Dem derbas dibû û gundê nenas, bû şahidê ketina wan stêrkan. Şev bêtir dirêj dibû, mirin dibişirî û diket bedena stêrkan. Şevêkê, sê stêrk ji ezman şemitîn û ketin çenga dîrokê. Û ji wir ketin dilê zarokekê. Dilekî ku jê evînen mezin difûre.

Ew gund bû şahidê beyanîkî...

Sibeyeke bi mij û moran...

Ew zarok serê xwe rakir û bi jiyanê re bişirî. Bişirînek xemgînî, lê bi hêvî. Dilê wî zanibû ku du rengên jiyanê hene... Reş û spî...

Wî zanibû ku jiyan, bi mirinê jî xweş e. Dilê wî pêk bi pêk mezin bû û evîneke mezin bar kir li piştê xwe..

Evîna bextewar

tu straneke bextewar î
di guhê min de
gava ku dengê te dibihîzim
Zîn tê bîra min

Xecê tê

Binevşa Narîn tê...

gava tu dikevî dile min, dibim;
Mem

Siyabend,

Cembeliyê Heqarî

gava dikevî çavê min roj tarî dibe
zarokek berşîr radibe ji xewê,
kenek dide asîman
heyv cihê xwe dide ronahî...
hezkirina te straneke bextewar e
dengê stranê û bilûrê tê guhe min,
dengê evîne...

tu di paca xwe de binêre, bibihîse
ba dengê min aniye ji te re
guhê xwe bidê
dibeje ku
"ez ji te hez dikim"
roj bi roj dikevî dile min
xezalê!

kî dibêje evîna bextewar tune ye
bextewariya min hebûna te ye...
sal bi sal dizivirim ber evîne

û

tê me ava Dîjle dibînim
belê ne şaş bû me

Dîjle rûyê te dibiriqîne nav avê
serê sibê re diçim rûye te dibînim
xwe davêjim ava Dîjle...

û

tu winda dibî

wekî ava Dîjle

dicemidim...

xwîna min diraweste

rayên min navêje

bê xwîn e, bê te...

Hebûn BRÛSK

Şêr û Şêrker

Îbrahîm MULLA

Kereka hêja ji xwediyê xwe reviya û çû mêrgeka fireh û rast. Kes nediçû wê derê, ji ber ko şêrek xerab li wê derê hebû. Çend rojan ker çêrî, û baz dida li ber aliyê mêrgê. Sibehek zû, şêr hêdî hêdî ji paş latekî li kerê nihêrt û got: "Gelo, ev dehbe çi ev dehbe çi ye?" Şêr, ker nas nekir. Hêdî hêdî şêr ber bi vî kerî de hat, heta nêzîk bû; bi zimanekî xweş li wî slav kir û got: "Min navê te nas nekir, ji kerama xwe re navê xwe ji min re bêje!"

Ker çend caran bazda, di wê mêrga fireh de, û pêt ji bin lingên wî dardiket û bi dengê bilind got: "Navê min Şêrker e!" Şêr, tirsîya ji ber ko navê wî mezin e. Şêr got: "Min divê ko bibim hevalê te." Ker got: "Xem nîn e!" Her du bi hev re man. Rojekî kerê ji şêr re gote: "Here ser çiyê û ji min re teyran bifirîne, da ez ji te re teyrêkî nêçîr bikim." Şêr çû û bi lez teyran firand. Teyr hemû bi jor ketin, lê teyrêkî hinek firiya û li ber kerê ket. Ket banî şêr kir û got: "Were, min teyrêkî mezin ji te re nêçîr kir!" Şêr hat, dît, teyrêkî mezin perê wî di lingên kerê de ye. Şêr teyr bir û gelek tirsîya û got ji xwe re: "Ew heywan dehbekî ecêbe! Teyran li ezman digire!"

Roja dîtir, şêr gote kerê: "Min divê ko em sobarî bikin!" Ker tirsîya, lê ewê çi bike? Bi hev re çûn, şêr xwe li çem xist û ji alî din ve zû derket. Lê ker, gelek di nav avê de ma, carek li ser avê û li bin. Piştî demekî derket û her du guhên xwe hejand. Çend masî jê weşîn û ji şêr

re got: "Min di bin avê de dom kir, da ku ez ji te re çend masiyan bigirim." Şêr gelek tirsaya û di ber xwe de got: "Divê ko ez xwe xelas bikin, ji wî dehbeya ko teyran li ezmên digire û masiyan di binê avê de nêçîr dike."



Di şevêkî reş da bazda, di nav lat û zinaran de bezî. Gur, rovî, hirç û herçî dehbe hebûn, bi wî re bazdan. Piştî, rovî hate ber şêr û got: "Tu jê kê direvî?" Şêr vegerand û got: "Qet nepirse, Şêrker nêzîke, teyran ezmên digire û masiyan di binê avê de nêçîr dike."

Lê rovî got: "Ew kerekî reben e, ez dikarim wî bikujim." Şêr lê vegerand: "Ezê lingê te vegirêdim û emê biçin." Lingên xwe bi hev re girêdan û vegeriyan ber kerê. Ker ji dûr ve wan dît û ji xwe re got: "Rovî, rewşa min kifş kir li ber şêr." Ker çend caran bezî, pêt û çirûsk ji binê lingê wî derket û ber bi şêr û rovî ve bezî û bi dengêkî bilind qîriya. Şêr tirsîya û ji rovî re got: "Şêrker hate me, divê ko em birevin." Şêr di nav lat û zinaran de bazda. Roviye reben li bin çengê kevir û kuçan ket, parçe bû, şêr tenê xwe gihande cihekî dûr û nema bû biqîre ji bilî lingên rovî...

Pinpinîk

Tu îdîdoka belek ya buhara derewîn
Kavilika dinyaya xirabe
Û dirêjbûna giyabirîn ya dawî
Wekî ku nêzîkayîtdan qet tunebe
Roj, vekîşandina pêlan bû ber vê okyanûsê
Dûr ve hildiweşiya dilxweşî

Ji peravên xwe ve hatim gemişandin
Dil li kersaxê xist, ne birîndar
Evîn keştiya ku av hilanîbû,
ez naxudayê keştiya tenêtiyê
Ez hatim girêdan bi pêhnika ku ez jê hatim hêlan

Min gotina xwe ya dawiyê li lûle bar kir
Li her rawestgehê, temenê min yê ku ez negihîştîmê
Li asoyê wînda bû, xeyalê li ser sêlakê
Ku min gotina dawî lê bar kir
Deng li cênîka min teqiya
Mirinê li lêvên min dadan
wekî kespikekê
Tu hêstîrek barkirî bûyî li ser bijangên min
Ewrên min tije baran bûn li ber lehî rabû
Temenê îdîdokî,
ji buhara derewîn ma....

Nûhat ÇELÎK

"Hêvîkirin, bi xwe her roj mirin e."
Nietzsche

"Beriya ku şoreşên me hebin, divê pêşî mehiyên me hebin!"

William Blake

Payîz

werza payîzê
wekî tavanên biharê
ji nişka ve bêtomyê dibarîne

di vê werzê de
xemgînî û bextewarî tevlihev dibe
xweza ber bi rengezeriyê ve diçe
pelçîmên dilan diweşin
sivênekên ku ji balindeyên
penaber re dibin wargeh
qul qulî dibin
hehecikên pîrozwer hêlinên xwe
ji dûvpişka re dihêlin
ji axa birîndar
çend kulm xwelî tê kolandin
ax axê dinase, axa nû kolandî
ya ku bi roj û stêran re
hevalbendiyê dike
ji hêla ya kevnare ve nayê pejirandin
li ber tava tûj qelş lê dikevin
mîna paniya bêrîvanekê
mîna dilê xortekî bengî

şevên payîzê
mîna tofana nûh erjeng in
dîtina rojê roj bi roj kêr dibe û
demên dojhê dest pê dike

di vê werzê de
stêrk xeydok in, serhildêr in
xwe li ber pêlên bayê dîn nagirin
ji bo demekî
di zirûfa tarîtiyê de wînda dibin û
li pey xwe tu şopekê nahêlin

di vê werzê de
êdî stêrk jî nayên temaşe kirin
jiyaneke bê wan
jîneke rijî ye...
dil teng dibe û dikizire
şevreşkên dojhê radibin lotikan
mirov macêr û penaber dibe

di vê werzê de
hêvîkirin her roj mirin e
alûleyên tolaz yekcar teng dibin
bircên Amedê stûxwar in
kolanên nû asfaltkirî
tinazên xwe dikin û şevên mayî
tên xesandin.....

Deşî REWŞEN

Xezoka Sofî Misto

Qedrî DÊRSILAVÎ

Rojek ji rojên havînê ye.
Amed germ e, dikele, hêk li erdê dibirije. Zarok û pîrekan xwe dane ber siyên dîwaran, dikandar û penêrfiroşan ji kursiyên torlî danîne kêlekên deriyên dikanên xwe û li ber siyê qorzîkan nitirandine. Texsiyeke Ford Tanûs bi kolana Mêrg Ahmedê (Melîk Ahmet) de berjêr dibe, berê xwe daye Xana Delîla, (Otêl saraya karwan a mezin). Sê zîlam û jinek di texsiyê de ne.

Ajovan, çiçelaskî û zilamekî bejindirêj, çavbeloq ku berçavkek reş li ber çav e, li pêşiyê ne û zilamekî qelew zikberoş ku qozîkên îşlikê wî ji bin şal revîne, qayîşeke çeprast di ser herdû milên xwe re bi pîziya (cihê doxîna) şalê xwe ve zeliqandiye û jinikekê li paldanka paşîya texsiyê rûniştine. Navê wê jînekê Hezal Xoşses e. Jinik dengbêjeke bi nav û deng e. Ev çend sal in li metropolan, di salon û televîzyonan de kilaman dibêje, pir bi nav û deng e. Her roj rojname û televîzyon ji deng, awaz û xweşikiya wê bahs dikin. Hezal hatiye Amedê ku çend rojan kilaman ji mêvanên otela Kerwan Sarayê re bêje, sebr û hedana wan bîne. Ji xeynî ajovan ew

her du zilam jî notirvanên (badigart) wê ne.

Hemû dikandarên Mêrg Ahmedê dev ji kar û bazara xwe berda ne, li xweşikî û bedewiya Hezal fericî ne. Bi rastî jî Hezal jîneke bedew e.

Porekî zerî, zêrînî li ser e, çavên wê wekî du heyvên çardehşevî, fanosên têr don dibiriq in. Mijankên wê yî misasî, dev û lêvên wê yî li hev sor û spî, wekî bastêqê zinarê ne, hinarokên rûyê wê wekî du sêvên Meletî, tili û pêçiyên wê weke find û şima, spî û zirav in, poz û bêvila findiqî, çaplên wê yî rût û spî wekî stûnên konê erebî ne, sê bazinên yektêlî di zendan de dibiriqin. Eniyeke fireh û bi deq. Çav û birûyên kilkirî, qeytanî, qelemkirî, bi ser hinarokê rûya de du biskên hinekirî dişildiqin. Şalekî sifincê Emerîkî, lê şidiqiye û îşlikekî hevrişim ku serê pêsîrê wê wekî heba nokê tere bel bû ne, lê ne. Berçavkeke rengînî gilover li ber çava ye.

Bi rastî jî Hezal li gorî nav û dengê xwe ye. Nav û dengê wê derketiye derveyî welêt jî. Êdî kasetên Hezal ne li welat tenê, li welatên cîran jî, ji kasetên hunermedên wan zêdetir tene firotin. Hezal kilaman bi tirkî distire, lê sewt û awazên wê awazên rojhilatî ne. Kurd û ereb û ecem (fars) ji tirkan zêdetir li Hezalê guhdarî dikin. Dengêkî zengilî, awazekî zelal û bêhneke dirêj li ser Hezalê ye.

Her roj bi sedan rojname, televîzyon û kovar li du ne ku pêre hevdişînekê pêkbînin. Heta niha piran ji wan pêre hevpeyvîn, roportaj

û gotûbêj kirine, pir tiştên girîng û sosret jê pirsîne, lê hîna jî kesî esl û fêslê Hezalê fam nekiriye. Hîna jî kes nizane Hezal kî ye, keça kê ye, ji kîjan bajarî ye. Deva deva tê gotin ku ew bi eslê xwe kurd e, lê kesî bi esehî ev fêslê nekiriye. Kê çi jê pirsîye, bi rastî û diristî bersîva daye, lê hîna kesî bersîva esl û fêslê wê, welatê wê jê ne girtiye. Her ku ev pirs hatine kirin Hezalê gotin biriye û gotûbêj qut kiriye. Ji ber vê jî kes nizane ku Hezal kî ye, ji kure, bavê wê kî ye, dayîka wê kî ye. Wê jî tu caran ji dost û hevalên xwe re jî bahsa dayîka û bavê xwe nedikir.

Heta ku Hezal li ber derê Otêla Kerwan Seraya mezin ji texsiyê peya bû û Silikê parsek ew dît ... Îcar em ji devê Silê Parsek esl û fêslê Hezalê bibihîzin. Silê Parsek dibêje:

“Ev Xezoka Misto ye, ez wê bi dê û bav nas dikim. Navê wê Xezalê bû, lê gundiyan jê re digotin “Xezoka Misto” Em û ew ji heman gundî ne. Dema em li gundê Dêrtiyalê bûn, em û wan cîranê hev bûn. Bi destpêkirina şer re, çawîş, em ji gund deranîn û gund şewitand. Ji naçarî ew jî wekî me hatin vî bajarî, em li taxa Fatîhê ketin xaniyekî xerabe, wan jî li Ben û Senê, axurekî ku zivistanê dewarên dermale dixistinê ji xwe bi sed hezarî kirê kirin, ketinê. Dûv re em jî hatin cîrantiya wan.

Dema ku Misto hate bajêr, keça wî Xezokê şeş-heft salî bû. Misto jî zilamekî feqîr û pir sofî bû. Nedihişt jina wî Gulê û keça wî Xezo derkevin ber derê kuçê jî. Heta sala wan zivirî bi çend qurîşên ku ji

gund bi xwe re anî bûn, debara xwe kirin. Lê piştî ku sal li wan zivirî, bi zorê xwe derxistin biharê. Misto nikaribû karekî bike û nedihişt Gulê û Xezokê jî derêne derve û karekî bikin. Karê ku bikirina jî nîn bû, lê belkî ji xwe re biçûna pincar, tolîk, bendik û qirşikan. Lê Misto ew jî ne dihişt.” Silê parsek berdewam dike û wisa dibêje:

Her sal di mehên nîsan û gulanê de keçikên taxê diçîne bexçê Hewselê tûyên reş (ku ji wan dibên “Qara hîbir”) berhev dikin û tînin li sûkê, ji xwe re difroşin. Pêşî çend caran cîranan û Gulê ji Misto re gotin; tu debara te nîn e, qene keçikê bişêne bexçe, belkî ji xwe re çend teyfik tu bifroşe û gezek nan ji were bîne, hûn bi bê minetî bixwin. Lê Misto ketibû intê, digot: “Ezê saxî nemirim, keça min Xezo çawa here sûk û kolan, tuyan bifroşe xelkê.” Me tevan digot: “Kuro zarok e, tişt nabe û tu jî feqîrî, fitwa te heye, Xwedê li te nagire.” Lê dîsa Misto ji a xwe ne dihate xwar û keçik nedişande derve. Pir neçû Misto bi nexweşîneke xedar ket û naçar ma ku ji çûna Xezo re dengê xwe dernexe. Xezoka reben ne cih zanibû ne dur, pêşî bi keçikên me û cîranan re çend caran çû, berhev kirin, bi hevalên xwe re xiste teyfika û li Deriyê Çiyê firot. Ji ber ku Xezo bi ziman (tirkî) nizani bû, di serî de ti tû jî nedifirotin. Lê Xezo bûbû wekî çûka ku ji qefesê bifilite. Roj bi roj derdorên xwe nas dikirin. Di çend rojan de çend peyvên tirkî hewisî û kuçe, kolanên Amedê nas kirin. Piştî çend rojan jî, Xezo êdî bi

serê xwe diçû bexçe û rojê neh-deh teyfik tû difirotin.

Di wan rojên ku Xezo û keçikên taxê diçûne tûyan rojekê Fexoyê Canbaz dengê wan kiribû ku di rê de keçik ji xwe re kilaman dibêjin. Îcar Fexo li qehwê ji me re got: “Kuro çi dengêkî xweş û zelal li ser vê Xezoka Misto ye. De wele xwediyê wê hebin dê ji Meyrem Xan û Eyşe Şanê jî bibuhure” em jî hînga pê kenîya bûn. Ez çi serê we bêşînim; Xezo di mehekê de ji hemû heval û hogirên xwe zêdetir kir. Êdî bi tena serê xwe diçû û dihat, çû heta Derê Çiyê, Ofîs û pir cihên dîtir. Ji xwe tirkî jî hewisî bû. Bi tiqe tiqê bersîva xwe dida. Ku meha hezîranê hat, tû qedîyan Xezoka me dest bi firotina ava sar, benîşt û selpakan kir. Pir neçû esnaf û dikandarên Mêrg Ahmedê û Derê Çiyê deng û awazên Xezo jî hîn bûn. Îcar tev lê dicivîyan pere didanê û pê kilam didan gotin. Ji ber ku pere ji Misto re tanîn, ew xwedî dikir, Misto jî razî bû. Qederê çar pênc mehan bi vî awayî, Xezo bûbû gula suka Mêrg Ahmedê û Derê Çiyê. Tevahî dikandaran ji Xezo hez dikirin, ku ne pêwîstbûna jî jê selpak dikirîn. Îcar wê salê (Xwedê zane deh sal heye) serê zivistanê bû, me di rojekê Xezo ji holê winda bû. Bavê Xezo Misto pir lê geriya hemû kuçe û kolanên Amedê li hev xistin. Lê ew nedît. Serî li qerakol û dadgehan da. Lê wan jî Misto çend rojan girtin binçav, gotin keça te derketiye çiyê û tu hatiyî pîrsa wê ji me dikî, di nava du rojan de, li kur dibe, divê wê bîni an na Piştî ku qereqolê Misto berda, Misto nema diwêribû ku

bibêje keça wî winda bûye û lê jî bigere. Misto yê nexweşokî, jî kerban re pir najot û mir. Gula reben jî hîngî giriya di du mehan de kor bû. Du sal neçû ew jî mir. Jixwe kes û xwediyên wan jî nîn bûn ku li Xezo bigere. Û zû de ye Xezo jî Misto jî û Gulê jî hatine ji bîrkirin. Ma kî yê feqîran bibîr bîne?....

dildarî

*jî bo xwişka xwe û
jî dildarên rizgariyê re*

mi go niza tê bala te
xelekên qeseli
ku me
dorpêç dikir zaroktiya xwe
li tara ezmana
û çerxa hêmayên bibar
biber sîpanê xelatê ve
berba dikir dildarî ...
û dema ku heyvê
pepikên rojê pêdikir
ku şeva fistanê teboxê
tavêtin ser xaniya
ez dimirim ji kêfa
melodiyên sirsirka û te dî me
şevbihêrik dimeyandin
ji delaliya
sterkên ku dirijyan
kefa desta
me tijî dikir cembek
ji cendekan
li hev pardikir xizani
û stêrkên mayî
dimelisîn
aramiya çava
mişt diman henek
ji mewîjokên
miştaxa rûwên te ...

Serkeft BOTAN

Navê çûyînê

Yildiz ÇAKAR

Şeveke xemrî dibişire wek bizmarekî li ser bajêr. Bayê azwer nameyên bê bersîv li ber deriyên bêxwedî diweşîne. Û ez piştî çûyina te lanetê tinîm bi kafirkî....

Di bin darekî hişk de me û li çûyina te difikirim. Niha tenetiya min û ya darê dişibe hev. Ne pelên minê sor mane ne jî yê darê. Wek du zarokên jî dê kî. Em her du bi tenê ne û kokên me hêdî hêdî ber bi rizandinê ve diçin. Dirizim, dar jî dirize. Ez bi temenê xwe ve diqermiçim, dar bi xetên sor pel diweşîne. Ditirsim li aweneyan binêrim. Kokên darê jî ji xwe.

-Ev çi dubendiye dilê min ?
Ev xezeba çi ye?

Min nedikarî nav li te bikira;
ne baran, ne bahoz...

Dizanim tu yê vegeî! Bêriya te dikim. Wek bêhna ku ji sînga dayîka min tê, te ji xwe re dikim dê. Hîn di bin dara hişk de me. Û xeyalên bizdonek rastî şevên min ên reş tî. Mixabin hîn şerm dikim ji te hez bikim. Tenê te wek wênayek qedexê diveşêrim di awêneya dil de. Tenê stêrkên derewçîn me temaşe dikin. Niha em her du li ser ewrekî şîn in û destên me hatine pêçandin bi hev re. Û vê carê em li stêrkan temaşe dikin. Pişt re kom dibin roj û şev. Li ser serê me dîlan digirtin. Lê me nedikarî çepikan bixista... Min di dilê xwe de ji stêrkan te dixwest. Lê li wir diyarî guneh bû, ez gunehkara herî mezin bûm. Dîsa dara hişk hate bîra min û vegeyîyam mala bê mal. Dîsa tenê me; ez û çûka di qefesa zîv de. Ev çend roj e dengê te nayê,

xeyalên te jî. Tenê çavên xwe digirim û tîm ba te. Wax li min! dîsa min riya xwe şaş kir. Niha di valahîya tenetiya te de li dara hişk digirim...

Dema ku ez vedigeriyam bajêr, tu dibû koçber ber bi bajarekî din ve. Bajar niha rengê xwe digûherîne. Û dara ku piştî çûyina te hişk bûye...

Sebra min nayê, ne di bin stêrkan de, ne jî ji desmala sor ya ku di paxila min de. Êdî behna te jê nayê..

-Destmal li ser şaxa hişk riziya wek darê, ez jî wek darê di bin siya wî de...

Niha dengê dengbêjan tê bi bêrikirina te ve. Her peyvek kilaman wek şewitandina gundan dişewitîne kezeba min.... Rondikên çavan dixeniqe li ser nexşên destmalê.

Destmal xwe li dara hişk dipêçe. Dîsa vedigerim mal, pala xwe didim dara hişk û wek rondikên destmalê, dixwînim çavên te. Çavên te îro bêkes in. Ez jî bêkes im, stêrkên asmîn û dara hişk.

Niha tu tune yî, ez jî tune me. Tunebûn dibe êş di dilê min de. Dil jî pîr dibe di bin dara hişk de.

-Ka bibêje! Ev evîn bijî di vî dilî de, ma dil pîr dibe? Hîn çavên te

dixwînim. Nizanim xwendina çavên te çi ye?

Hîn di bin dara hişk de me, dar hêdî hêdî dimire, şevçirayên ku di şaxên min de vebûne niha stûxwar dikeve. Dergûşa dayika min niha li ber hilweşandinê ye. Nav li wir li min dihat kirin, lê hîn navê çûyina te tune ye.

Hîn di bin darê de me, îro dar bê sî ye. Dara ku bê sîbe nav çi ye li ser zimanê te? Bêhna mirinê ji kîjan alî ve tê. Çima rengên tarî para min dikeve? Û çima pelên darê bi bayê sar dîn dibe?

.....
Tê bîra te!

Te digot porê xwe dirêj meke! Lê min porê xwe li ser çûyina te kur dikir. Dayika min a sedsalî hawar dikir;

-Erê por kurê!
Xwelî serê! Çi bûye te?

.....
Li ser navê çûyina te ketime tayê.

Navê ku/bi fîzînek/li bergoşa

guhên min ket/niha dişkên wek şaxek.

Di bin darê de me, dar digrî û libikên darê diniqûte dilê min. Deriyê dilê min vekirîbû, pelên deryayê hatibûn xezabê. Niha dizanim pizotên xezabê dişewitîne rondikên çavên min.

Min nameyek şand. Ji bo vegera navê te. Hîn bersîva nameyên min nehatin dayîn. Deng tê, ez çi bikim vê dengê. Porê min ê dirêj li



nav hev dikeve, deng zêde dibe,
qîrîn asê. Biskên reş-tarî ji bo te
diquse. Lê te bizanî ba her por dirêj
kirin ji bo te...

Di bin darê de me hîn, ne roj e
ne şev. Dem ne diyar e. Ji ber ku dar
rizyaye. Di kortikên rizyayî de
kurmorîkên reş li hev şa bûne, niha jî
tu dilê min de jan. Serê min li ser
çonga te ye.

Germahiyekî tenik tê tewafê.
Li tewafê, tofan tê. Bi tofanê jî
mirin....

Hîn di bin darê de me, dar êdî
nagirî.. Vê carê min dest bi girî kir.
Lê hêstirên min nayên xwarê.
Hewce me Xwedê! Ji bo niha destê
xwe vedikim. Niha li ber mizgefta
reş, li ber serê pirtûka pîroz stûxwar
im. Her du baskên min şikestî ye.
Tenê li ber serê min kevirekî sar,
destmaleke sor û darekî hişk çay
dişkîne. Çi bêjim derewe. Niha dil li
ber pîr bûnê ye...

Ajona sedsalan

Li belika guhê erdêxe
eynika dîlîtiyê
Bila wesle wesle bibe
rûkê bêbextiyê
Dane çargavê
teresî û xayîntiyê
Loo! Siwarê ba-
blîsoka rewan!
Bi ku de herî tu vê şevê!..

Bêkes FARQÎN

Helbestvan

Azadiya pêûska min bê dawî ye
Welat bi welat digêrînim
Li qiraxa robaran datînim
Gul û beybûnan jê re tînim
Li asîmana xweş difirînim
Kevokên aştiyê pê re dişînim
Li serê çiya digêrînim
Bi xezalan re dipeyvînim
Carcaran dixeyidînim
Bi strana biratiyê li hev tînim
Helbestvan im, bê ziman im
Van helbestan dinivîsînim
Ji bo jiyanê binexşînim
Ji nava şeran direvînim
Di koza aştiyê de dijînim
Carcaran di tengasiyê de dimînim
Bi xeyalên evînê xwe dixapînim
Di destpêka biharê de
Bi batînokên sor dixemilînim
Demsal kîjan demsal be
Evîn, azadî û jiyan
Ezê wan bi hev gihînim

Sîdar JÎR

“Xwe amade bike / da babîsokên
serberdayî yên ferhenga te /
bînçikandina min ji keferata mirinê
nas bikin.”

Ehmed Huseynî

“Me êriş kir hev wek şêr û gur
Heta roviyê reş penêrê me bir.”

Cegerxwîn
